Sultanê teralî serxweş qîma xwe bi vê yekê jî ne aniye, fermana girtina wê daye. Lê belê, rojnameya Kurdistan, biryara berdewamiyê sitandiye, ji ber êrîşên hovane yên dstelata Osmanî, cihê xwe ji welatekî guhestiye welatekî din, tîrêjên zanistî û rewşenbîriyê li welêt belav kiriye.

Digel tunebûna dibistan û zanîngehên bi kurdî û êrîşên tund ên dij gel û zimanê wî, bi saya serê xebatkar, zanyar û têkoşerên gelê me, zimanê me li ber xwe daye û di şerê tunekirin û pişaftinê de bi ser ketiye, xwe parastiye û îro bi milyonan kurd seranserî Kurdistan û cîhanê pê dixwînin û dinivîsin.

Di vê bîranîna pîroz de, em bi navê weşana **Newroz** hemî nivîskar, helbestvan û rewşenbîrên kurd pîroz dikin, bi hêvî ne ku em hemî bi hev re riya mezinên xwe bişopînin, xameyên xwe ji bo berjewendiyên gelê xwe bikar bînin û hemî bi hev re gurzek gul pêşkêşî giyanê nemir **Miqdad Bedirxan**, **Malbata Bedirxaniyan** ku ji rewşenbîriya kurdî re bûne hîmine berz û hemî xemxur berketiyên ziman û çanda kurdî bikin û cejna we pîroz be.

Desteya weşana **NEWROZ**

Gotina kovarên berpirsiyar di bîranîna 109 saliya rojnamegeriya Kurdî de

Em,bi navê kovar û rojnameyên Kurdî,yên li Sûriyê têne weşandin (**Aso; Jîn; Hevind; Deng; Gelawêj; Newroz; Perwan; Pirs; Roj; Vîn**),bi navê **komîta fêrbûna zimanê Kurdî**; **komîta Celadet** û bi **navê komîta çalakiyên kurdewarî**,wilo jî bi navê hemî piştgir û heskerên ziman, rojname û rojnamegeriya Kurdî,vê bîranînê li xwe û we pîroz dikin.

Bi helkeftina vê bîranîna pîroz, bîranîna 109 saliya rojnamegeriya Kurdî ,em dibînin ku kovar û rojnameyên binavkirî pêma û berdewamiya rojnameya Kurdistan in û nivîserên wan pêma û berdewamiya rewşenbîriya Kurdî ne, ew in yên çapemeniya Kurdî,di demên serwext de, hembêz kirine û hembêz dikin û hêja ne ku nûnertiya rojnamegeriya Kurdî, li Sûriyê,bikin. Bo vê yekê,em wî mafî didin xwe,didin kovarên xwe,didin nivîser û xwênerên van kovaran,ku ew in xwediyê rasteqîn ji rojnamegeriya Kurdî re,li Sûriyê,û pêşdeçûna rojnamegeriyê ji wan tê xwestin û bi wan nîşan dibe. Loma,em bi hêvî ne,ku bîranîna 109 saliya rojnameya Kurdistan(roja rojnamegeriya Kurdî) bibe zîlana rolnaskirina rewşenbîrî û bibe hêzeke xwirt di riya çespandinên resen û petî de. Da em,bi hev re,desthilatê avakirina weşaneke şûngirtî bin,da pirsên rojnamegeriyê di çerxeke ronîda de bigerînin,da xameyên me bibin neynika pirsên civaka xwe û bi erkên rojnamegeriyê rabin,da desthelatê vejîna kevnetoreya xwe bin û karibin civaka xwe ber bi banbilindiyeke mirovane û şaristane de bilivînin.

Bêgoman,em pileya rewşenbîrî û rojnamegeriya Kurdî,li Sûriyê,di astengiyeke berbiçav de dibînin û dipelînin.Loma,gotûbêj û gengeşên rojane,bi mebesta çareserkirina vê pirsê,li dar in.Ev guftûgo hewildana pileya bîrgeşî,têgihiştin û rolnaskirina rewşenbîrî dikin,da faktorên banenizmî,bêkêrî û bişûndemayina civaka xwe dorpêç

——→